**Xelata Saxarov ji bo Jînayê, gaveke baş bû ji bo piştevaniya Kurdan**

»»»» R:7



**Fitneya rejîmê dibe sedemê sernixûniya bilez**

»»»» R:3

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (456) 10-24-2023Buha (1000) Tûmen

**Rewşa Îranê piştî «Şûrên hesin» hember «Tofana El-Eqsa»**

»»»» R:6

**Şerê Xezê ber bi kûve diçe?**

»»»» R:8

## Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat: Dana xelata Saxarof bi tevgêra “Jin, Jiyan, Azadî” deskevtekî dinê ye wê tevgerê ye


Roja Pêncşemiyê 19ê Çirriya Pêşîn a 2023 an, Xelata “Saxarof” bi “Jîna emînî” û tevgêra “Jin, Jiyan, Azadî” hate pêşkêşkirin. Ev biryara Yekîtiya Ewrupa tevî evê ku cihê rêz û pêzanînê ye, piştevanî kirin ji tevgêra mafxwazane a gelên îranê bi dijî dîktatoriya rejîma komara îslamiya Îranê ye û wekî deskevtekî dinêye tevgêra “Jin, Jiyan, Azadî” tête hesibandin.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, tevî rêzgirtin ji vê biryara Yekîtiya Ewrupa, bi hêceta pêşkêşkirina Xelata Saxarof bi Şehîd “Jîna Emînî” û tevgêra “Jin, Jiyan, Azadî” pîrozbahiyê li dayîk û babê Jîna Emînî, û tev qurbaniyên bêgunehe vê tevgerê, û xelkê Kurdistan û gelên Îranê dike.

Hizba Demokrat a kurdistana îranê
Navenda Birêveberî
20ê Çirriya pêşîn a 2023



## Kak Mistefa Hicrî: Em weke PDKÎ di milê nasnameya netewî de, nûneratiya civatgehekî zindî dikin




Deqa axiftina Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî a Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li konferansa “Li pêxema yekîtiyekî giştgîr û demokratîk” li Firanforta Alman.

Xelkê azadîxwaze Îranê !
Hizb û aliyên siyasî !

Bo min gelek cihê keyfxweşiyê ye ku ez îro bi nûneratiya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve, dîtin û nêrîna giştiye tevgêra Kurdistanê û bi xasmanî nêrîna wê Hizbê li derheq ragihandina platforma “Hevpeymaniya Giştgîr” bi we radigehînim.

Nêrîna me bi baldan bi ceribandina dûr û dirêj û dîroka serberedayîya Îranê, li esas de rûyê wê ber bi aliyê pêşerojê ye. Pêşerojek ku têda Îranekî dinê bête avakirin. Îranek ku tê de îrade bi dijî tewawiyetxwazî îca bi her şiklekê be bisekine. Îranek ku rastiyên di nava cografiyaya siyasiye vê, cihê efsanên tewawiyetxwaziya kevn û oldarî bigre. Rastiyek ku tê de ciwatgeh gorî hez û îrada xwe û tevî mafê vekhev, li gelhev jiyanê biceribînin û nasnama wan bi fermî bête naskirin. Em bînine bîra xwe ku tevgêra “Jin, Jiyan, Azadî” nûneratiya derfetekî mirovahiyê û dûre dîmena pêşerojê dike û şiyana avakirina Îranekî cuda ji ya berê heye, ev jî girêdaî bi vê naskirin û têgiheştina kûr ve ye ku divê me li gotara bingehîn û pêşkevtî de hebe.

Îro demokrasî wek derfetekî destpêkî, şiyana bersivdanê bi piraniya pirsyaran li derheq nasnamê de heye. Li rewşa niha de, em wek tevgêra rizgarîxwaze Kurdistanê û herwisa tevgêra nasnamexwaziya netewên jêr sitem û hemî azadîxwazên Îranê, em xwe di nava bazinekê de pênase dikin ku livê de siyaseta demokratîk û cihgir û bingehîn a pêşeroja Îranê, li jêr siya çareseriya pirsan be, neînku siyaseta înkar û tepeseriyê.

Ewa ku li eslên “Hevalbendiya Giştgîr” de hatiye, mafê mirov ji eslên herî bingehîne hevalbendiyekî wiha li pêşeroja Îranê de dibe. Nêrîna me li derheq mafê mirov, nêrînekî piraktîkî y. Bi gotinekî din mafê mirov li hizirgeha vê pilatforma yekgirtî ve, berjenga têgiheştin û fêmkirinekê ve ye ku birêve birina vê girîngtire ji vegeryana bo yasayên bingehîn ku egera hindê heye bête diyarîkirin. Çimku qebûlkirin û bi fermî naskirina cudahiyan em bi girîng dizanin heta pirsekê ku paşê û li pêşerojê de kar li ser bête kirin.

Bi fermî naskirina Îranê weke cografiyayekî çend netewî, pirsek nîne ku li pêşeroja Îrana azad de û li yasaya bingehîn de em bi dû de bigerin, belku li çwarçêwa mafê mirov de, pirseke bi temamî sirûştî û aşkeraye ku qebûlkirina vê li ewşekî taybet de dikare kevrê xîm û pîvana ji boy berhevdana bavera bi kiryar bi pirsên mafê mirov û pirsa netewî li îranê de be.

Îrana îro li ser du pirsyarên înkar kirinê hatiye avakirin. Ji aliyekê azadî û mafê kite kesiya microvan ji aliyê rejîmên dictator ve li vê cografiya yê de hatiye red kirin, û ji aliykî dinêve ciwatgehanasnamexwazî ji aliyê rejîmên tek nasnameyî- qewmiyetî bi baskirina dîroka kevn û wilayetmedar û bi hêceta tewawiyeta erdî û ewlehiya netewîî hatine tepeserkirin. Lêre de pirsekî girînge ku me hewcehî bi peydakirina bersiva vê heye û çarçêweyekî zelal û dûredîmenekî diyarîkirî jêre destnîşan bikin.

Bo çêkirina derfeta guhertinê di vê rewşa dayixistî de, hevalbendiya bi wî awayî hevdem digel qebûlkirina fireşêwaziyê û piranî û cihkirina wê, dikare riya wekirî be bo çareseriya demokratîke pirsên neçareserkiriyê li Îranê de.Hevdem nabe em vê rastiyê jî ji bîr bikin ev jî ev nav û niçkên li vê hevalbendiyê didin. Çimku dezgehên teblîxatiye rejîma komara îslamiya Îranê û bermayîyên hizra tewawiyetxwazî herwisa zindî ne heya ku hêzê bidne rewşa înkar û tepeseriyê li cografiya Îranê de.

Ewa erkê meye heta ku bi dilekî vekirî ve, yekîtî, lihevkirin û hevalbendiya zêdetir, wêneyekî baştir û hişmendane bidne raya giştî, wêneyekku me mînaka vê li mehên destpêka şoreşa “Jin, Jiyan, Azadiyê” de dît. Wêneyek ku tenê li pey azadî û rizgariya ji dest tewawiytxwaziyê de bû. Çimku ev bavere hebû û heye ku em dikarin li gel hev bin û pêşerojekî cuda çêbikin. Lewra şertê me li rewşa niha de tenê xebat û hevxebatî bi dijî rejîma komara îslamiya îranê nine, belku dana pilatformekî giştgîr e ku bikare nûneratiya fireşêwaziya netewî û nasnama wê cografiya ya hemereng bike.

Dostên rêzdar!

Em wekî Hizba democrat a Kurdistana Îranê li ware nasnameya Kurdistanî de, nûneratiya civatgehekî zindî dikin. Tewî pêbendbûn bi eslên pesendkirî li vê yekîtiyê de, em bidestveanîn û bi gerxistina demokrasiyê li pêşeroja Îranê de, girêdayî bi yekîtiya bi kiryare aliyên azadîxwaz û bi hewcehiya pirsa neteweyî û demokrasiyê dizanin.
Ewa ku dive em tekeziyê li ser bikin ewaye ku demokrasiya kûr û mafê mirov dikare tenê li ser bingeha mafê diyarîkirina qedera xelkê li ser piyan be û pirsyarên weke deshilat, dadperwerî, keramet, mafê kitekesî û netewî bo civatgeha nasnamexwaz û jêr siteme li Îranê de bê bersiv nemînin.
Berhevdanekî wiha dikare îmkan û xalekî guhertinê be ji bona dawîpêanîna bi tewawiyetxwaziyê. Lewma hewceye ku berjewendiya aliyê hembere me û hevalbendiya giştgîr û berdewam sermeşqa hizr û kiryara heçî kîjan ji aliyan be heta ku bikarin bidne selimandin ku hekî Tehran, azerbayîcan, Kurdistan, Sîstan û Belûçistan, Ehwaz, Turkemen Sehra, Mazenderan û yên dine li ser rêkê nebin, Îran ti carî nabe Gulistan.

# Fitneya rejîmê dibe sedemê sernixûniya bilez



**N: Nûredîn Sofîzade**







Wan rojan heya qasekê li bi siya şerê di navbera Hemas û Îsraîl de, çavê media û nûçegihaniyan û baskirin ji bûyerên nava îranê de yan bi temamî hatiye qutkirin, yan hinde kêmbûye ku ti mediayek bas nake.

Bi wî awayî xûya dibe ku ger demkî be jî, rewş bi qazancê rejîma dîktator diçe pêş û deshilatdarên rejîmê vê yekê bo xwe bi derfet bizanin ku heya qasekî zêdetir û ji berê hovanetir destê xwe beredayî bibînin û çinayet û tepeserî û girtin û kuştina azadîxwazan bi sanahîtir encam bidin.

Gerçi agir û fitne û şer û aloziya ku niha li Îsraîl û Felestînê de diqewime, hemî dunya dizane ku bi pîlan û fermana dîktatorê Îranê çêbûye, lewma çi guman li vê hindê de nîne ku yêk ji mebestên rejîma dîktator û şexsê Elî Xamineyî her eva bûye ku çavê cîhanê li ser bûyerên Îranê bigere û balê bikêşe ser wî şerî.

Çimku asta xwînrêjî û malvêranî û nîgeraniya ser wî şerî hinde mezine ku şev û roj hemî media yên cîhanê giraniya kar û nûçe û raporên xwe terxan kirine bo ser wî şerî ku eva jî bi kêf û ser dilê rejîma Îranê ye.

Rejîmê ezmûn li cinayeta xwe a kuştina keça Kurd Jîna Emînî de hebû, gava heman cinayet li ser keçekî dinê ye Kurd a bi navê Armîta Girawend encam dan û rewşa wê keçê ku kevtibû komayê bala hemî cîhanê bo aliyê xwe rakêşabû û şev û roj li media yan ve dihate baskirin û rejîm ji tirsê serhildan û bigurtirbûna şoreşa Jin Jiyan Azadî, beecî bû, bê guman agirê fitnê li Xeze û Îsraîl de hilkir.

Gorî dawî zaniyariyan Armîta canê xwe ji dest daye û rejîmê pîlana dana nûçeyên Qetr çekanî girte bera xwe ku hêdî hêdî nûçeya mirna Armîta yê rabigehîne ku êdî hem bo xelkê asyî bibe û hem kelêjana şoreşê dakevtibe, û hem malbat û dayîk û babê Armîtayê soz bidne rejîmê ku vê pirsê ne li ser xwe û ne jî li ser rejîmê mezin nekin.

Rejîm herwisa li jêr siya şerê Xezê de, rojane lavên welat li sêdarê dide, cinayet û girtin û kuştinê li ser gelê şoreşvane Belûç encam dide, Azadîxwazan û çalakên di warê cuda cuda de digre û hukmê giran bi ser wan de disepîne, nawçên Rojhilatê Kurdistanê milîtarîzetir dike û rojane lavên Kurd dide ber gulleyan û dikuje.

Em bizanin kanê rejîmê ger çi bi awayê demkî kariye rewşekî bi wî rengî hem bo xelkê Îranê û hem bo nawça Rojhilata Navîn biafirîne, heta çi qasekê serkevtî bûye û armancên xwe hasil kirine. Ger çi rejîmê bona dewama emrê xwe û tepeseriya xelkê Îranê û peçavtina cinayetên xwe li nav xweya welat de fitna Xezê çêkir û jêvebû ku nexşê qirêje vê dê bo hertimî û bi qazancê rejîmê tewaw be, lê her tişt bi berewajî derkevt, hemî cîhan û Îsraîl û welatên herêmê gelek baş haya wan ji vê rastiyê heye ku ev şer bi fermana rejîma Îranê û rêberên vê hate kirin û ev mûşekên ku ji aliyê Hemasê ve hatne havêtin bi Îsraîl, hemî mûşekên rejîma Îranê û bi diraf û piştewaniya Îranê hatine dabînkirin.

Bêguman ne cîhana azad, ne welatên xwedî bandor û Îsraîl û hevalbendên xwe, her wisa bisanahî li ser vê fitneçîtiya rejîma Îranê re derbas nabin, ku bû sedemê malvêranî û kuştarekî mezin û nîgeraniya hemî cîhanê. Rejîma Dîktatore Îranê ev fitne kir da ku xwe ji şoreş û sernixûniyê xelas bike, lê nedizanî ku ber kestekê revîye ber kevir û bi wî karî bû sedemê rakêşana piştgîriyekî zêdetire cîhanî bo aliyê şoreşa Jin, Jiyan, Azadî û guloka rîsê xwe bo aliyê sernixuniyê bileztir kir.

Hemî nexşe û armancên rejîmê bûne bilqên ser avê û rûyê metirsia zêdetire dîktatoriya Wilayeta Feqîh bo her kesî îsbat bû û hemî cîhan ji hebûn û mana rejîmekî wiha nîgeranin, û hekî berê tenê şoreşa li navxwe hebû bi dijî dîktatoriyê û welatan û civatgeha navnetewî bi parêz û têbînî raya xwe didane xûya kirin, niha êdî tenê xelkê Îranê nîne û belkî hemî cîhana pêşkevtî dê cehdê bike hindî zû vê reh û koka fitne û şer û terorê ji nav bibe.

# Apartaida sîstematîke komara Îslamî dijî Netewa Kurd



N: Dr.Mecîd Heqî

Apartayd ( Apartheid ) li mêzegeha ferhanga peyvan tê wateya veqetandinê, ku di siyasetê de jî heman wateyê dide. Apartayd bi piranî bo welatê Afrîqaya Başûri li ber cîbicîkirina siyaseta nîjadperestiyê dijî reşpêstan ku bi awayekî dewletî, sîstematîk û yasayî bi rê ve diço dihat gotin.

Encama vê cudahiya nijadperest despêkirina tevgera dij-apartaydê bû, ku di dawiyê de bû sedema serbestberdana xebatkarê azadiyê yê hevzayend "Nelson Mandela" piştî 27 salan di zindanê de di sala 1990 de, piştî çend salan tekoşîna li dijî rejîma Apartayd. "Nelson Mandela" heta sala 1999'an weke serokê Afrîqaya Başûr hate hilbijartin û bû sembola têkoşîna li dijî nîjadperestî û azadiyê û di 5'ê Kanûna 2013 de jiyana xwe ji dest da.

Heman siyaset û kiryara li Îranê jî li dijî netewa Kurd û netewên bindest tê meşandin. Lê belê ev rastî ji bo cîhana rojava û belkî ji bo gelek Îraniyên ku ji neteweya serdest in, nayê dîtin. Apartayd bêhtir bi navê "nijadperestî" tê naskirin, lê di Komara Îslamî ya Îranê de, apartayd kirasekî dewletî, sîstematîk, yasayî û olî kiriye ber xwe.

Em behsa apartaydê li Îranê dikin, ji ber ku piraniya cudahiyan li Îranê hem li ser esasê destûr û hem jî qanûnên ku ji aliyê Meclisa Şêwra Îslamî ve hatine derxistin û biryarên dewletê ne. Di rastiyê de cudakarî li Îranê qanûnî û bi organîze ye.

Apartayd di Komara Îslamî de bi destûra bingehîn a welat dest pê dike. Komara Îslamî komarek olî ye ku dînê wê Îslam e, li gor maddeya 13 ya qanûna bingehîn a Îranê, ola fermî ya wî welatî de 12 îmamiyê Şîe ye. Bi gotineke din, li Îranê di bin desthilata rejîma Îslamî de tiştek bi navê mirov nîne, çawa ku li Afrîqaya Başûr ne "mirov" bûn xwediyê mafan, lê "nijad" û "spî" xwediyê hemû mafan bûn.

Apartayd di qanûnên Komara Îslamî de eşkere ye:

Dewleta Îranê endama gelek konvansiyon û peymanên navneteweyî yên mafên mirovan e ku bi awayekî xwezayî divê ji aliyê qanûnî ve girêbide û cîbicî bike. Beşek ji van peymanan di serdema rejîma berê de û hinek jî piştî deselata Komara Îslamî de hatine vajo kirin û erêkirin. Îran endama peymanên navneteweyî yên mafên mirovan, bi taybetî Peymannameya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (Daxuyaniya gerdûnî ya mafên mirovan, û peymana navneteweyî ya mafên medenî, siyasî, aborî, civakî û çandî) ye Divê qanûnên Îranê di çarçoveya van peymanan de bên darêtin. Lê ji dema damezrandina rejîmê ve, hem destûr û hem jî yasayên din ên rejîmê berevajî naveroka peymanên navdewletî ne. Eva li halekê ye ku rejîma berê ew peymanên hanê bê şert û merc qebûl kiribûn û Komara Îslamî jî ji dema damezrandina xwe ve ji van peymanan venekişiya û neçar e naveroka van peymanan cîbicî bike.

Destûra Îranê destûreke "îdeolojîik û îslamî" ye, yanî li ser bingehê îdeolojîkê ye, hemû xalên destûr û yasayên Îranê li ser vê bingehê tên şopandin. Bi gotineke din, li gorî yasayên Îranê, kesên ku wek mînak, girêdayî bi îdeolojiya wan nîne, şîeyên 12 îmamî ne û baweriya wan bi desthilata mutleq nîne, hemwelatiyê Îranê nayên hesibandin û ji hemû mafên welatîbûnê bêpar in. Destûra îranê ne tenê bûye sedema cudakarî û apartayda sîstematîk li dijî jinan, ol û mezhebên din, neteweyên bindest û kêmîneyên olî, belkî bûye sedema nakokiyan di navbera saziyên curbicur ên rejîmê de, ji ber ku her aliyek têgihîştina xwe li ser ol heye. Girîngtirîn navenda ku mafê şirovekirina destûr û yasayên Komara Îslamiya Îranê heye "Şêwra parêzvaniyê" (Şûray Nîgehban)e ku biryarder û rêvebirên wê ji aliyê Xamineyî ve têne destnîşankirin.

Naveroka qanûna bingehîn a Îranê apartayde e, ku tê wateya cudakirina hevwelatiyên nav welatekê de. Divê hemû berpirsên Komara Îslamî ji binî ve heya serî şîe bin û baweriya xwe bi wîlayeta mutleqe feqîh anku Xameneyî bînin. Komên olî yên din jî di nav de Sunnî û Şîe jî ku baweriya wan bi dewleta hiqûqî nîne, nikarin



beşdarî proseya rêvebirina welat bibin.

Li gorî beşa çarem a destûra bingehîn a Îranê, divê hemû qanûnên welêt li ser esas û pîvanên îslamî bin, ewa jî bi wê wateyêye ku gorî beşa (12) destûrê bingehên hemû yasayan li ser esasa şîe a "Ceiferî esna Eşerî" wate 12 îmamî bihên pejirandin.

Artêş û Muhafizên Şoreşê yên Komara Îslamî ya Îranê hêzên çekdar û îdolojîk in. Yanî erkê artêşê ne tenê parastina sînorên welêt e, di heman demê de tepisandina "dijminên Xwedê û Îslamê" ye jî. Li gorî destûra bingehîn a Îranê, artêş û sipaha pasdaran li gorî ayeta Qurana pîroz: "hemû hêz û şiyana xwe ji bo neyarên xwe û Xwedê bikar bibin" erkidarin ku neyarên Xwedê ji nav biben. Li 19ê tîrmeha 1979 (19.8.1979) Ayetollah Xumeynî li dijî neteweya Kurd fermana cîhadê da û ew wek kafir û dijminê Xwedê bi nav kir. Di wî warî de Dijminatiya Komara Îslamî ya Îranê ne tenê li ser fermanên cîhada Xumeynî û Welî yê Feqîh e, ku deshilat û fermanên wan ji yasayan bilindtir in, belkî li ser esasê deshilatdariya "Welayeta motleqeye feqîh" dujminkariyek sîstimatîk û ser bingeha qanûna bingehîne rejîmêye.
Li gorî qanûna bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê, sîstema dadweriya Îranê li ser bingeha rêgirtin li holê derketina ummeta îslamî hatiye ava kirin. Li gorî vê yekê, hemû girtin, îşkence, kuştin û heta kuştina dijberên rejîmê, bi taybetî çalakvanên Kurdistanê, weke beşeke ji paqijkirina umeta îslamî tê dîtin.

Apartayda abûrî
Li gorî xala 13 ya beşa (3)a qanûna bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê, erkê dewletê ew e ku "ji bo avakirina refahê, jinavbirina xizaniyê û jinavbirina her cure bêpariyê, aboriyeke saxlem û dadperwe, pêşveçûna bingehên tendurustiya giştî li gor prensîbên îslamî dîzayn bike".

Komara Îslamî ya Îranê berawajîya wê xala destûra bingehîn a xwe, bi

Dom R:5

Doma R:4

awayekî sîstematîk cudakariya aborî li dijî Kurdistanê û netewên din ên bindest, ji wan Belûçistanê, pêk tîne. Li gor amarên fermî yên Komara Îslamî ya Îranê di sala 2021 de, rêjeya hejariyê li parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê piştî Sîstan û Belûçistanê ji asta Îranê zêdetir e. Rêjeya nawîne xizaniyê li Iranêde 31,4 % e. Li Sîstan û Belûçistanê rêjeya hejariyê 62% bûye, li parêzgehên Kurdistanê yên Îlam, Kirmaşan, Sana û Urmiyê jî rêjeya hejariyê 42% bûye. Heman hejmar ji bo waliyên farisîaxêv jî ji sedî 17,3% bû. Wek mînak rêjeya xizaniyê li Tehranê 19% û li Semnan û Yezdê 17% û 16% bû.
Zêdebûna sîstematîk a dabeşkirina hejariyê li parêzgehên Kurdistan û Sîstan û Belûçistanê tevî hebûna çavkaniyên binerd û civakek ciwan û xwenda ji ber çend armancan e:
Yekem: Komara Îslamî bi dabeşkirina hejariyê di nava Kurdistanê de dixwaze ciwan û hêza karker a Kurd neçar bike ku ber bi nawenda Îranê ve biçin û bi wî awayî Kurdistanê ji hêza kar, ciwanî û dînamîkên ku dikare bibe sedema geşbûna herêmê bêpar bike. Ji aliyek din ve rejîma Îranê bi awayeke piratîkî rê li ber sermayerazandinê li Kurdistanê girtiye û bi awayeke nediyar qedexeya sermayerazandinê li Kurdistanê de sepandiye û ji ber vê yekê jî baştirîn berhemhêner û sermayedarên Kurdistanê derketine derveyê Kurdistanê bo mînak li Tehran, herêmên dine pîşesazî yên îranê sermaya xwe razandine.

Duyem: Valakirina Kurdistanê û koçkirina ber bi Îranê, pilana asîmîlasyona sîstematîk a dewletê ya li dijî ziman û çanda Kurdî di pêvajoyek di navbera nifşan de dê bête cîbicîkirin û hesta kurdayetiyê ya xortên Kurdan bê tepisandin û pêvajoya fariskirina gelê kurd bi lez bête cîbicîkirin. Ewa jî şiklek ji paqijkirina netewî jêre tê gotin.

Sêyem, bi valakirina Kurdistanê ji xortan, temenê navînî li Kurdistanê dê zêde bibe û nifşek ku li berxwe bide û têkoşîna neteweyî û rizgariya Kurdistanê bimeşîne û pilana yek netewe, yek çand, yek ziman û yek alî li serdema rejîma Pehlewî de hatiye dariştin bi awayek sîstimatîk û bi jenosayda nerim tê cîbicîkirin.

Kesên ku naxwazin Kurdistanê Terik bikin, neçar dimînin ku dest bi karên ku ji bo wan nehatine xwendin, bikin, bi rastî jî ciwan û malbat hest dikin ku piştî temenek berhemanîna perwerdehiyê jiyana xwe winda kiriye.

Ev yêke jî dibe sedem ku rêjeya nexweşiyên derûnî û xwekuştinê di nav Kurdan de ji deverên din ên Îranê zêdetir bibe. Kesên ku berê xwe didin karê dijwar û xeternak kolberiyê diken, ji bo pêdiviyên aborî yên malbatên xwe bi cih bînin, neçar dimînin jiyana xwe bixin xeterê. Tê texmînkirin ku rojane yek heta sê kolberên Kurd ji aliyê hêzên çekdar ên Îranê ve tên kuştin û birîndarkirin. Ev jî ji bilî amarên wan kesaneye ku li zivistanê de dikevin bin reniyan an ber sermayê jiyana xwe ji dest didin an seqet dibin. Li wê amarêde hesaba kelûpelên ji nav çûye kolberan û kuştina hesp û dewarên wana berçav nehatiye kirin ku buhaya wê xwe li sedan milyon tûmenên Îranê dide.

Berhema giştî ya Navxweyî (GDP) pîvanek bi bandor a asta refahê û belavkirina ewlehiya aborî û civakî di nav civakê de ye. Her ku asta GDP zêde dibe, tê pêşbînîkirin ku asta refaha gel jî zêde bibe. Zêdekirina GDP yek ji armancên herî girîng ên siyaseta welatan tê hesibandin. Bi danberheva asta navencî ya GDP li Îranê, parêzgehên Fars û parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê, tê dîtin ku siyaset û stratejiya giştî ya dewletê ew e ku xelkê hejar bike û rê nede mezinbûna berhema navxweyî li Kurdistanê. Li gor lêkolînên zanîngeha Tehranê, di sala 2023 de, asta navincî ya berhema navxwe ya parêzgehên Kurdistanê tenê ji 1,388 % bûye, di heman demê de ku parêzgehên Farisî bi rêjeya ji 13,593 % û rêjeya niştimanî jî ji 3,225 % bûye. Yanî dahata navxwe ya Kurdistanê nîvê naverastiya neteweyî bû. Berawirdî hilberîna neftê ya ku li seranserê welêt nayê belavkirin nayê hesibandin. Lêkolîna zanîngeha Tehranê îsbat dike ku koçberiya ji parêzgehên neteweyên bindest, di nav wan de Kurdistan û Belûçistan, ber bi "navendê" ve çavkaniyek din a mezinbûna GDP ye. Ev lêkolîn jî nîşan dide ku Komara Îslamî ya Îranê bi awayekî sîstematîk hewl daye ku potansiyela aborî ya Kurdistanê ji nav bibe û nehêle ku geşepêdana wekhev û berdewam bi dest bixe û potansiyela wê ya aborî ji bo bexteweriya xelkê bê bikaranîn.

Beşa 9 a destûra bingehîn a Îranê, bi navê parastina yekparçeyiya xaka Îranê, di pratîkê de behsa mafên netewî yên neteweyên Îranê bi tewawî qedexe dike. Yasaya cezayê ya Îranê ( yasaya cezaya tawanên piropagendeya nejadi pejirandî li 1356.4.30) axaftin li ser cudahiya olî, nijadî û etnîkî qedexe dike û yasaya çapemeniyê jî axaftin li ser cudahiyên etnîkî û zordestiya civakî û etnîkî qedexe dike ku "Yekparçebûna Axa" welat li ser welat ferz dike. Ji ber vê yekê zilm û zordariya netewî li Îranê bi pêvajoyeke yasayî tê kirin û mafê kesî nîne ku li dijî vê yekê derkeve. Ji ber ku dijayetiya van zulm û zordariyên han tê wateya metirsiya "ewlehiya netewî" (yasaya hudûd û qesas) û "yekparçetiya axa" welat (maddeya 9 a qanûna bingehîn a Komara Îslamî).

Apartayda zimanî
Apartayde sîstematîk a Komara Îslamî ya Îranê jî li dijî ziman û nasnameya neteweyî ya gelê kurd tê dîtin: Navên kurdî bi giştî li Îranê nayên tomarkirin yan jî eger hatine tomarkirin, divê navekî erebî (îslamî) li gel wan hebe. Di sala 2019 de bûdceya edebiyata farisî li Îranê 26 milyar tûmen Îranê bû. Dewletê ji bo her peyveke farisî 11 milyon tûmenên îranî xerc kir. Zimanên din ên erdnîgariya siyasî ya Îranê, wek Tirkiya Azerî, Kurdî, Tirkmenî, Gilakî, Erebî, Belûçî û yên din, ne tenê budçe negirtine (berevajî xala 13 a Destûra Bingehîn a Îranê), belkî ew kesên li ser hesaba xwe û bi awayê dilxwaz xebat kirin ji bo pêşveçûna zimanê xwe yê dayikê dihatin girtin û zîndanî kirin. Wê gavê jî hejmareke zêde ji çalakvanên zimanê Kurdî, Tirkî, Gîlek û Belûçî di girtîgehên rejîma Îslamiya Îranê de ne û bi tawana cudahî xwazî, seperatîzm û pêşxistina "nijadperestiyê" di Îranê de hatine mehkûmkirin. Zara Muhammedî mînaka herî naskirî ya vê yekê ye ku 5 sal cezayê girtîgehê lê hatiye birî. Di sala 2022´an de, bûdceya dewletê ji bo geşepêdana zimanê farisî li cîhana mecazî û vîrçûal, 653 milyon tûmenê Îranê bû, di heman demê de rejîma Komara Îslamî rê li ber avabûn û geşepêdana zimanên din bi taybetî zimanê Kurdî di cîhana virtual de digire.

**Apartayda siyasî**

Bikaranîna şîdet û tundiyê li dijî civakê diyardeyeke din a pêvajoya apartheidê ya li dijî neteweya kurd e. Li gotara terorismza saykolojîk (Agirî hejmara 455) de li ser tundûtî û şîdeta derûniya rejîma Îranê diji neteweya Kurd hat gotin. Bi kurtî, tenê di dema Şoreşa Jin Jiyan Azadiyê de, piştî kuştina Jîna Emînî ji aliyê rejîma Îranê ve, 56% kuştiyên xwepêşandanan li Kurdistan û Belûçistanê bûn. Li gor amaran zêdetir ji 70% ji girtiyên siyasî yên bidarvekirî Kurd in û zêdetirî 50% ji girtiyên siyasî yên Îranê Kurd in. Kurd tenê 14%ê nifûsa Îranê pêk tînin.
Kovara (faslnamêye motaleatê stratêjîk) a Zanîngeha Leşkerî ya "Parastina Neteweyî", zêdebûna nifûsa Sunne (yanî neteweyên ku ne farsin) wekî xetereya ewlehiyê bi nav kir. Di vê derbarê de rejîma Îslamiya Îranê hewl daye ku li deverên weke Rojhilatê Kurdistanê û Sîstanî û Belûçistanêrêjeyên mirin, xwe kuştin, juştinên di rêye qezayên tirafîkê û kuştian kolber û "sûxtberan" rê li ber zêdebûna nifûsa van neteweyan bigire.
Li gor lêkolînên Rêveberiya Lêkolînên Wezareta Tendirustiyê, asta nexweşiya penceşêrê (qenser) a dil, mîde û rûvî bi taybetî mîde û mîdeyê li parêzgehên Kurdistanê ji tevahiya Îranê zêdetir e. Li gel ku dermankirina vê penceşêrê li Kurdistanê eger ne namimkûn be, gelekî zehmet e û nexweş neçar in koçî bajarên Tehran û Îsfehanê bikin. Sedema sereke ya vê penceşêrê zextên aborî û siyasî û di encamê de belavkirina sîstematîk a dermanan di nav gelê Kurd de ye.

Apartayda yasayî dijî kêmaniyan li Iranê

Ji bilî van tiştên ku li jor hatin daliqandin, Destûra Bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê bi van awayan apartheidê siyasî û sîstematîk bi cih tîne: Cudakirina di navbera misilman û nemisilmanan (Mînak: Xiristiyan, Cihû, Zerdeştî, Yarsnaî, Behayî û ateîst), Cudahiya navbera şîyeyan û mezhebên dine îslamê, cudahiya nav bera şîeyên 12 îmamî bi mirevên xwe û yên din, cudahiya nav bera jin û ziam û cudahiya nav bera jin û zilamên n musulman û jin û zilamên ne musulman û ....

Îdyolojiya paqijkirina nasnameyan ji bilî nasnameya fermî ya ku Komara Îslamî ya Îranê û desthilatdariya pêşiyê wê kirine hedefa xwe, bi awayekî sîstematîk û rewa tê meşandin, heman siyaseta ku li Afrîkaya Başûr û Afrîkaya Başûr li dijî reşikan dihat meşandin. Hemû yasayên pêwendîdar ên Komara Îslamî ya Îranê berevajî peyman û daxûyaniyên mafên mirovan in ku Îran li ser wan îmze kiriye û divê bi awayekî yasayî pêbend bin. Îranê hewl daye ku ji bo yasayên xwe hincetên "olî" û "şerîî" peyda bike û bi vî awayî apartaydê bike tevgereke olî û beşek ji "cîhada îslamîkirina" neteweya kurd. Dema ku serokê rejîmekê fermana cîhadê li dijî neteweyekê dide, tê wateya derxistina wî miletî ji Îslamê û erkê umeta îslamî ye ku yan wî miletî ji ser rûyê erdê paqij bike yan jî bi darê zorê misilman bike.

# Rewşa Îranê piştî «Şûrên hesin» hember «Tofana El-Eqsa»



N: Elî Munezemî



Her şer û pevçûnek ku di cîhanê de bi giştî û bi xasma li Rojhelata Navîn de derdikeve, rasterast bandor li ser Îranê jî dibe ku ew bandora dikare erênî an jî neyînî be. Ew bandora demekê tesîra wê zêdetir dibe ku Îran yan hevalbendê wê alîyeke wî şerî bin û tilîya Îranê di wî şerî de hebe.

Rejîma Îslamî a Îranê, Îsraîlê bi fermî bi dijminê xwe dihesibîne û bo nehêlana wê dixebite û pirr caran îlan kiriye ku piştgirîya wan alîyan dike ku li hember Îsraîlê şer dikin an jî bi her şêveyekê dijayetîyê tev de dikin. Peyvendîya navbera rejîma Îslamî a Îranê û Filistînîyan dizivire pêş serkevtina şoreşa gelên Îranê. Lê rejîma Îslamî her carê tevî hindek li Filistînîyan peyvendîyên baş hebûne. Peyvendîyên Îran û Hemasê piştî ku Filistînê di sala 1988an de Îsraîl bi fermî nas kir, bilind bûn. Peyvendîyên wan li dema serhildana şerê navxweyî li Sûriyê de, daketin. Li ber ku Hemasê nexwast li berjevendîya Esed de, tev vî şerî be. Lê li dema niha de, peyvendîyên navbera Îran û Hemasê û Îran û Hizbullaha Lobnanê gelek xurt in.

Îran xêncî alîkarîyên bi pere, bi çek û teknolojîyê jî piştgirîyê dide Hemasê û ew yeka xêncî zaf alîyên din, li aliyê Hemas û Îranê bi xwe ve jî eşkere bas jê tê kirin û veşartî nîn e. Ewa hemû li demekê de ye ku Hemas li lîstê terrorîstî de ye û alîkarîya wan bi wateya alîkarîya terrorîsmê tê hesibandin. Lê ma kê heye ku nezane Îran bi xwe makeya terrorê e!?

Di 7ê çiriya pêşîn a 2023an de şerek nû li navbera Hemas û Îsraîlê bi hêrişta Hemasê bo ser Îsraîlê û bi kuştin, rehîn girtin, komkujî û gelek cinayetên din destpê kir û ew şer bi «Tofana El-Eqsa» bi nav kirin. Îsraîlê jî hember wê hêrişê de bertek nîşan da û operasîyona xwe ya bi navê «Şûrên hesin» destpê kir û ewa yekimîn car e ku li 1973an şûn de, Îsraîl bi fermî şer îlan bike.

Her li destpêka derkevtina wî şerî de, hemûyan bal kişandin ser Îranê. Li ber ku hemû alîyek baş wê rastîyê dizanin ku Hemas bi bê erê kirina Îranê nikare şerek hanekî destpê bike. Her wisa veşartî jî nin e ku hêzên Hemasê ji alîyê pisporên Îranê ve perwerdeya çekdarî-terrorîstî distînin û bi Mûşekan hatine çekdar kirin. Îranê li destpêkê de dîsa pişta Hemasê girt. Lê gava ku dîtin wê carê ne wekî carane, haşa kirin ku ewan fermana wê hêrişê dabin yan tilîya wan tê de hebe. Zûm kirin û balkişandina ser Îranê di wî şerî de, rewş li Îranê pir aloz kir. Li ber ku hem Amerîka bi şandina keştîyên şerker, li kêlega Îsraîlê cih girt û hem jî di wî şerî de gelek hemwelatîyên welatên din jî hatin kuştin ku eger aşkera be ku destê Îranê di wî şerî de heye, ew li Îranê qebûl nakin û baca wê jî yê giran li ser Îranê bikeve. Ewa jî bi xwe yê bibe serbarê wan hemû arîşeyên ku Îranê tewî welatên din û civaka navnetewî heye bi sedema dosîya etomî û terrorîsmê.

Niha Îran cehd dike ku bi hemû şêveyekê wî şerî li Xeze de sinûrdar bike ku pel nehavêje bo cihek din. Li ber ku eger ew şera li Xeze û Îsraîlê derbikeve, ne hêsan e ku Îran lê dûr bisekin e an nekşînin bo nav şer. Xêncî wê yekê, xûyaye ku Îran dixwaze bi zûyî şer were sekinandin. Li ber ku eger şer nesekine û Hemas jar û lawaz be, ew yeka xeterek mezin e li ser rejîma Îslamî a Îranê. Xelkên bindest li Îranê de, li wê rejîmê bêzar e û rejîm hebûna xwe qerdarê wan grûpên terrorîstî e li derve ku bikare pê wan xwe li ser lingan rabigre.

Eger şer bê sekinandin, Îran dikare gelek mifahê jê werbigre. Îranê bi wî şerî karî rûmeta erteş û hêzên sîxûrî-parastinî yên Îsraîlê bişkêne. Ewa li demekê de ye ku heta niha Mosad li hember Îranê baş derketibû û çendîn pisporên Îranî kuştibûn yan li Îranê de girtibûn û lêkolîn tev de kiribûn.

Îranê bi wî şerî karî li hev nêzîkbûna Erebistanê û Îsraîlê bide sekinandin û ewa jî zerera her du wealatan jî tê de heye.
Ew şera bû sedem ku dewleta serokkomar «Biden» (Baydin) jî heta qasekê di wî şerî de bê sûçdar kirin. Li ber ku ew şera piştî hindê derket ku Amerîka, 6 mîlyard dolar perê Îranê yê astengkirî, azad bike ewa jî bo sedem ku wisa bê fam kirin ku eger ew pere nebana, Hemasê nedikarî wî şerî destpê bike.
Kurtegotin:

Şerê Hemas û Îsraîlê dikare pê Îranê jî bikşîne nav şer. Lê rejîma terrorîstî a Îranê cehd dike ku nehêle ew yek bê serê wan. Li egera şikandina Hemasê bi xurtî, terrorîsma Îslamî a Îranê jî lavaz dibe û ew yeka jî bo aramî û aştîyê di Rojhelata Navîn de pêngavek baş e. Lê eger şer bê sekinandin û Hemas jî her Xeze li bin desthilatdarî wê de bimîne û ew jî li ber alîkarîyan, her bin destê Îranê de bin, hingê rejîm hem li hember welatên din û hem jî yê hember xelkê bindest li Îranê de yê dirindetir û hartir be.

## Nerîna Lîderan



**"Emmanuel Macron":**

"Divê welatên ku digel DAIŞê şer kirine li şerê li dijî Hemasê jî hevpeymaniyê çê bikin"



**"Benjamin Netanyahu":**

"Armanca Îsraîlê jinavbirina yekcarî ya Hemasê ye û em ê bi yekcarî wan ji nav bibin".



**"Rishi Sunak" :**

"Teqîna hefteya borî ya li nexweşxaneyeke Xezeyê bi îhtîmaleke zêde ve bi mûşekên Îsraîlî nebûbe armanc, lê ji ber mûşekek ku ji hundirê Xezeyê hatiye avêtin bûye armanc".



**"John Kirby"**

"Em dizanin ku rejîma Îranê piştevaniya girûpên terorîstî dike û em dizanin ku armanca Îranê ew e ku di vê mijarê de tedbîra destwerdanê bidomîne. Em rê nadin wan ku vê yekê bikin".

# Xelata Saxarov ji bo Jînayê, gaveke baş bû ji bo piştevaniya Kurdan



**N:Eskender Ceiferî**



Piştî ku keça Kurd bi navê Jîna Emînî di nîva Îlona 2022'an de li Tehranê ji aliyê polîsên rêjîma faşîst a Tehranê ve hat şehîdkirin, xwepêşandanên li dijî rêjîmê li Kurdistanê dest pê kirin û pişt re li herêmên din ên Îranê belav bûn.

Ev têkoşîn, niha bi navê Jin, Jiyan, Azadî tê binavkirin.
Di rojên derbasbûyî de jî xelata Saxarov ji bo Jîna û malbata wê hate pêşkêşkirin.

Ev derfetek e ji bo ku Kurd bikarin dengê mafxwaziya xwe zêdetirî ji berê hildin.

Ji destpêka şoreşa Jînayê ve her roj vîdyo, wêne û rapor ji Îranê derdikevin ku siyaseta baviksalarî ya rêjîmê nîşanî me didin.

Ger di bin desthilatdariyeke wiha faşîst de rewşa jinan biguhere, wê bandorê li ser rewşa jinan li welatên din ên Rojhilata Navîn ên weke Iraq û Afganîstanê jî dabinê.

Vê têkoşînê heya niha kariye ji çend aliyên cîhana rojava destekê wergire, lê ev têra nake. Ew xelk ji bo azadiya jinên cîhanê têdikoşe. Niha jinên li Kurdistanê û herêmên din ên Îranê nûnerên jinên welatên din ên Rojhilata Navîn in.

Jin di vê têkoşînê de bi tenê nîn in. Di vê têkoşîna mezin de ji bilî jin û zilaman, homoseksuel, LGBT û kêmîneyên din jî cih digirin. Ev yekemîn şoreşa jinan a cîhanê ye ku li Kurdistanê dest pê kiriye û pêwîste li hemû cîhanê bê bicîkirin.

Rojnameya Lîberation a çapa Parîsê di raporekê de eşkere kir ku şaredariyê, biryar standiye ku wêneyê Xumeynî avakerê rêjîma gemar a faşîstên Tehranê rakin û li dewsa wî, wêneyek ji serhildana Jîna danîne wir.

Herwisa her piştî ku şoreş bi gurr bû, Annalena Baerbock wezîra derve ya Almanya ragihandibû ku ew dîsa li Îranê riftara hovane ya rêjîmê li hemberî xelkê dibînin. Sipaha Pasdaran ya rêjîmê her roj xelkê têror dike. Lewma niha pir girîng e ku pêleke din ya dorpêçan bixin ser rêjîmê û bi taybetî ser Sipaha Pasdaran. Wê got ku dîsa em bi awayekî eşkere dibêjn em li rex xelkê wêrek li Îranê disekinin û em têrorkirina welatiyên Îranê ji aliyê rêjîmê ve şermezar dikin.

Beriya niha jî Komeleya Mafên Mirovên Kurdistanê li Jenevê ji Neteweyên Yekbûyî xwastibû li dijî rêjîma faşîstên Tehranê tevbigere.
Parêzvanên Mafên Mirovan, Ensemble Contre la Peine de Mort, û Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê-Jenev piştgirîya avakirina şandeyeke navneteweyî ya serbixwe ya lêkolîna rastiyan li Îranê kiribûn. Pişt re jî bi alîkariya Kurdan ew şande hate avakirin û wê şandeyê bi rapora xwe Îran şermezar kir.

Di daxuyaniya wan de hatibû: Ji dema ku xwepêşandanên li seranserî welat piştî şehîdkirina keça ciwan a Kurd "Jîna Emînî" dest pê kirin, sedan şehîd hene ku beşeke zêde ji wan jin û zarok in.

Rejîmê bi hezaran kes ji ber ku tevlî xwepêşandanên aştiyane bûne binçav kirin. Wan bi kêmanî şeş kesên ku bi xwenîşandanan re têkildar in, li ser bingeha sûcên nezelal ên şerê li dijî Xwedê an gendeliya li ser rûyê erdê, bi darvekirinê siza kirine.

Herwisa gotin ku em ji ber bikaranîna hêzeke zêde ya desthilatdaran li dijî xwepêşanderan, bi taybetî li Belûçistan û Kurdistanê, gelekî nîgeran in.

Her wiha bi tundî windakirina bi zorê ya xwepêşanderên birîndar û kuştî û redkirina rayedaran ji dayîna cenazeyên kuştiyan ji malbatên wan re şermezar dikin.
Hêzên zordar ên rêjîma Komara Îslamî li Tehranê jî êrîşî zanîngeha Şerîf kirin û çend demjimêran zanîngeh dorpêç kirin. Ew jî piştî protestoya xwendekaran û bi danîna kemînan ji bo xwendekaran dihat û tê de di encamê de hejmareke mezin ji xwendekaran hatin binçavkirin û ji wan xwendekaran jî li wir hatin birîndarkirin.

Tawaneke din a Komara Îslamî êrîşa li ser girtîgeha Êvîn a li Tehranê bû. "Êvîn" bi kiryarên dijîmirovahî yên li dijî girtiyên siyasî û çalakvanên biyanî yên ku di zindanê de tên ragirtin navdar e. Tê gotin ku bi sedan welatiyên binçavkirî yên vê dawiyê jî li vê girtîgehê ne.

Di encama vê êrîşê de bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan.

Mafê jiyana azad, jiyaneke bi rûmet û hebûna mafên siyasî û civakî, beşeke bingehîn a mafên mirovan ên vê serdemê ye. Mafê ku ev 45 sal in ji aliyê rêjîma Komara Îslamî ve tê zewtkirin û ji gelên Îranê hatiye standin.

Niha piraniya bajar û deverên Îranê ji Kurdistanê heya Belûçistanê, ji Ehwazê heya Azerbaycanê, ji Gîlanê heya Tehranê, Îsfehan, Meşhed û bajarên din bi tundî ji aliyê rêjîma Komara Îslamî ya Îranê ve tên tepisandin û rojane bi kêmî em şehîdkirina kesekî ji aliyê rêjîmê ve dibînin. Komara Îslamî hemû riyên têkilîdanîna bi mirovên derveyî Îranê re digire yan jî kontrol dike. Niha gelek dijwar e ku bi bajar û navçeyên curbicur ên Îranê re têkilî çê bibe û Komara Îslamî ya Îranê bi qutkirina înternetê û rêyên din ên girêdana gel û çewsandina raperîna gelên Îranê hewl dide ferzkirina dîktatoriya xwe li ser gelên Îranê bidomîne.

# Şerê Xezê ber bi kûve diçe?



N: Ebdulezîz Qasim



Wekî dizanin ku (Şerê Gazayê) ji aliyê Tevgera Hemasê ve berî çend rojan bi çend êrîşên çekdarî û kiryarên berfireh yên kuştin û revandina serbaz û xelkê sivîl yên Israelê di roja Şemiyê 7ê Cotmehê de destpê kir, ku hin jî didomîne. Di demê ku danûstandin di navbera hinek dewletên Erebî û Îsraîl de dihatin pêkanîn û gihiştibûn astekî bilind, bi taybetî danûstandin di navbera Erebistana Saudî û Îsraîl de, ku bi awayekî berçav pêşve diçûn, ku berî çend rojekî ev yek di daxuyaniyekê de digel kanala Fox News li ser zarê Şêxzadê Saudiyê Mîr Mihemed kurê Selman di roja Çarşemê 20ê meha Îlûna borî de hatibû dûpatkirin û balkişand bû ku danûstandin digel Îsraîlê (Roj bi roj pêşdikevin).

Hevdem ku ev danûstandin û têkiliyên ji demeke dirêj têne pêkanîn ji bo asayîkirina têkiliyan di navbera Saudî, Îmarat û Îsraîl de, ku dikevin di çarçoveya projeyekê mezin yê Wîlatiyên Yekgirtî yên Amerîkayê de, nemaze piştî zêdebûna bizavên Rûsya û Çînê, ku li vê dawiyê hindek pêngav bi serpereştiya Çînê hatin pêkanîn bi armanca normalîzekirina têkiliyên Saudiyê digel Îranê, û ji ber ziyanên vî şerî yên mezin li ser jiyana xelkê sivîl û rewşa Rojhilata Navîn, Serokê Amerîkayê Biden di daxuyaniyekê de êrîşa Hemasê şermezar kir û got: “ku wisa xuya dike ku kiryarên Hemasê ji yên DAIŞê xirabtir in”.

Tevlî ziyanên mirovî yên vî şerî, lê ya herî girîng ku çarenivîsa pêvajoya asayîkirina têkiliyan di nav Îsraîl û Ereban careke din ketin di metirsiyek mezin de, ku Amerîka bi hemû hewlên xwe bi salan dixebite ji bo aştiyê, nemaze îro dixebite ji bo dûrkirina Erebistana Saudiyê ji bazarên aborî û siyasetên Çîn û Rûsyayê, nemaze piştî beşdarbûna wê di Lûtkeya BRICS de û asayîkirina têkiliyên diplomatîk digel Îranê.

Goman di wê yekê de nîne, ku her rêkeftinek di navbera Erebistana Saudî û Îsraîlê de, helbet dê bibe sedema têkçûna têkiliyên wê bi Îranê re, û piştre dê bibe dergeh bo berfirehkirina têkiliyên Îsraîl bi tevaya dewletên Erebî re û herwiha dê zemîneke xweş peyda bibe li pêş xurtkirina têkiliyên Amerîka û Îsraîlê jî ber bi dewletên Asaya wek Malezya, Endonezya û Pakistanê ku dê têkiliyên Amerîkayê bi Asyayê xurtir bibin, zêdebarî cîbicîkirina projeya Korîdora Kesk ya ku Asyayê bi rêya Hindistanê di nav axa Erebistana Saudî û Îsraîl re derbasî Ewropa bibe, herwiha dê bibe alternatîf û rêgir li pêşiya projeya Çînê yê bi rêya Tirkiye û Îranê.

Piştî vê xwendina kurt û herwiha ji ber têkiliyên xurt yên di navbera Hemas, Tirkiya û Îranê de, dikarin bêjin ku êrîşa Hemasê li ser Îsraîlê di van şert û mercên niha de, yekser dikeve di berjewendiya Îran û Tirkiyê de. Di heman demê bi şerekî bi wekalet di berjewendiya çend dewletên Asaya de, wekî Çîn,û Îran û Tirkiyê jî, herwiha ji aliyek din ve bi şerekî li dijî berjewendiyên Amerîka, Ewropa, Hindistan û Erebistana Saudî tê zanîn, û axaftina Wezîrê Derve yê Amerîka Anthony Blinken vê yekê piştrast dike, dema got: (ku operasyona Hemasê bi deh qatan ji ya 11ê Septembera 2001ê mezintir e). Lewra me dît, ku Amerîka her di demjimêrên pêşiyê de, biryar da bi şandina çek û cebilxane û gemiya firokehilgir ya Amerîkî Gerald Ford nêzîkî peravên Îsraîlê bo rê li berfirehbûna şer bigire, ku serdana serokê Amerîka Biden bo Îsraîlê û Rojhilata Navîn dikeve di heman çarçoveyê de û herwiha bo dûpatkirina piştgiriya Îsraîl, di heman demê de, ku Artêşa Îsraîlê ji aliyê xwe ve, hêzên xwe li ser eniya şer li ser sînorên Xezê û Lubnanê xurt dike û xwe bo şerekî mezin amade dike, da bikaribe bersiva her êrîşekî bide li ser eniyên şer û her jêder û çavkaniyên metirsiyê, bi tayebtî li ser eniyên şer li hember Hemas û Hizibulah.

Tevî ku hêjî şer bi dawî nehatiye û di destpêka xwe de, wisa xuya dibe ku ev şer di demekî kurt de wekî şerên din bi dawî nabe, û vê carê Îsraîl rijde li ser têkbirina Hemasê bi yekcarî û dûr nîne ku saziyên nukleerî û navendên atomiya Îranê jî bêne armanc kirin, nemaze ku Netanyahu û Gantz bi siyaseta Biden ya li hember Îranê nerazî ne, lê niha piştî şerê Xezê, wisa xuya dike ku siyaseta Amerîka li hember Îranê û Hizibulah dê hişktir be, nemaze piştî armanckirina berjewendiyên wê li Rojhilata Navîn bi awayekî micid, lewra tê pêşbînîkirin ku bersiva Amerîka li hember Îranê bi taybetî piştî şerê Xezê dijwar û girantir be.



# Urmiye û kirîza perwerdehiyê








N: Dara Nariq

Urmiye ku yek ji bajarên herî girîng û sitratêjîk yê Îran û rojhilatê Kurdistanê ye û sinûrên sê dewletên Turkiye û Îraq û Azerbaîcanê li hev di warê tiranzîta bazirganî û alvêrê li hev girê dide, di varê çavkaniyên bin erd jî herêmek herî dewlemend û bi buhaye, lê mixabin bi gelek kirîzên bingehîn yên weke sîstema perwerdehî, abûrî, jîngehî û arîşeyên civakî re berbirû ye.

Emê di vê gotara xwe de herî zêde balê bikêşîne ser sîstema perwerdehî ku çavan bûye qorbaniyê siyasetên qirêj û dujminkarane yên rejîma Îranê. li gor wan raport û nûçeyên ku ji zarê rayedar û berdevkê wezareta perwerde ya ku di mediya û rojnameyên welêt de belv bûnî, bajarê Urmiyê di asta perwerdehî û bi taybetî xwandinê de, di rêzbenda 28'mîn a welêt de ye.

Bûdceya hewce bo dabîn kirina îmkanat û nûjenkirina qotabxane û sîstema perwerdehî a wî bajêrî pir kêm û gurey hewce nine. Wê gavê pêwîstiya wê parêzgehê aliyê kêm nizîk bi 5000 hizar qotabxaneyan heye ku werne çêkirin. Serbarê ku roj bi roj astê heşîmeta wê parêzgehê jêhel diçît rêjeya zarokên qotabxaneyan zêde dibe lê qotabxaneyên hewce bo wê asata zêde ya xwandekaran pir kêm in. Ew qotabxane û navendên xwandinê yên ku heyî jî pir kevnin û hevcehî bi nûjenkirinê hene û rêjîm tu bûdceyek bo nûjenkirina wan terxan naket. Di beşeke zaf ji gundan de, zarok di kanêksan de dersê dixûnin.

Ew kanêks jî piranî ji aliyê xelkê xêrxwaz we hatine kirîn. Beşek ji wan mamostayên qotabxaneyan heta astê xwandina wan ya zankoyê ji tuninin û bi avayek pir seqet û lawaz waneyan dibêjin. Li gor gotina berdevkê wezareta perwerde, wê gavê sertaserê Îranê hewcehî bi damezrandina 200hizar mamostayan heye ku rejîm ji ber kirîza abûrî nikare wan damezrêne. Ji ber kêmbûna hiqûqê mamostatiyê û nedana hiqûqên karmendan di dema xwe de tu kes hazir nine heta pîşeyên xwe yên mamostatiyê jî berdewam bike. Gelek zarok her di asta seretayî a xwandinê de dest ji berdewamiya xwandinê hildigrin. Rêjeya zarokên ku dest ji xwandinê berdidin zêdetire ji wê rêjeya ku li nû de diçin qotabxaneyan. li gor wan amarên fermî ku têne belav kirin, zêdetir ji 180'hizar kes di bajarê Urmiyê nexwandevanin. 25 ji sedê a kuran û 45 ji sedê a kiçên ku zanko tewaw kirine wê gavê bêkarin û tu delîveyên karî bo wan nehatine dabîn kirin.

sîstema germkirina polên dersên standard nînin, di salê de dehan karesatên agirberûnê çêdibin û bi dehan xwendevanên weke qotabxaneya şînavê dibin qorbanî. mixabin Keçên Şînawê, piştî 8 sal jiyana digel birînên xwe yên kûr, ku bîranîna wê rûdawê nexweştirîn rûdawa jiyana wan e, heta niha jî bi tewawî nehatine çareserkirin, û berpirsên Rejîma Îranê jî ji hinartina wan bo derveyê welat, bi hêceta hebûna dermanên hewce di nav Îranê de, amade nînin keçên Şînawê bişînin derveyî welat û werne çareser kirin.

Rejîma Îranê Helandina ziman, çand, dîrok û nerîtan bi giştî hewldanek e ji bo ku astengan çê bikin û neteweya ku bihelînin, weke di perwerde û pirtûkan de tê dîtin. Herwiha di şano û sînemayan de jî ev yek bi zelalî tê dîtin."Rewşa jiyan di parêzgeha Urmiyê de, tevî hebûna çendîn neteweyan, zêdetirin asta çavedêrî û kontrol ji aliyê rejîma Îranê ve heye, û xelkê wan deveran bi taybet xelkê Kurd di wê parêzgehê de rastî cudatîdanîn, guhnedan û pêrenegihîştin ji aliyê berpirsên rejîma Îranê ve dibin û ji piraniya xizmetguzariyan bêpar in.

Bi giştî sîstema perwerdehî û pêregehîştina asta qotabxane û polên dersê û îmkanatên hewce bo kerta giştî a perwerdehiya bajarê Urmiyê pir lawaz û kirîzdar e. Ew sîstema seqet û guhnedana rejîmê bi kerta perwerdhî û xwandinê di wî bajarî de bûye sebeb ku piraniya zarokan bêhêvî dibin û her di qonaxên seretayî yên xwandinê de dest ji xwandngehan hildigrin û

li ber rewşa xotab ya abûrî û nebûna delîveyên karî berê xwe didin karê kulberî û pir dijwar û dibne nêçîra çete û terorîstên sipaha pasdaran û jiyana wan dikewe xeterê û tê kuştin û zîndanî kirin û eşkence kirin.
Ewa me di serî de îşare pê kir beşek biçûk ya wan arîşe û kirîza kûr ya ku xelkê îranê bi giştî û rojhilatê kurdistanê bi taybetî û xelkê bajarê urmiyê bi xasmanî pê re berbirûn.

# Bikujên Mirovhez



**N: Serbest Urmiye**




Di êrîş bi navê" Bahoza El-Eqsa" de ku baskê şerajo yê Hemasê b navê Ezedîn Qesam 14 rojan berî niha li dijî Îsrayîlê destpêkir û tê de hejmareke zêde xelkê sivîl hatin kuştin û heta qasekê taqima destpêker a şer kete nava axa Îsrayîlê, bû sedma bersivdaneke cidî û xurt ji aliyê dewleta Îsrayîlê ve. Bi terzekê ku hemû dem û dezgehên wî welatî hatin ser hêlê û îlana rewşa awarte ya şer hate kirin.

Ji destpêka şerê han ve heya niha raman û helwestên cuda di cîhanê de hatine girtin. Bi hizir û ramanên cur bi cur dijberî yan piştevanî li aliyên şer hatiye kirin, ku xelk û rejîma Îslamî ya Îranê di vê derheqê de bê par nebûne. Lê di nava hemûyan de helwestên civak û rejîma Îrane pitir bala mirov dikişîne. Ji ber ku rejîma Îranê dîrokeke direj di dameziranđin, bihêzkirin û piştevaniya taqimên şerajo di Filistînê de heye û neveşartiye.

Her çend ku di şerê nû de rejîma Îranê hewil dide xwe jê veşêre û hebûna xwe tê de red dike, lê di heman demê de, di asteke bilind de piştevaniyê jî li taqimên Felestiê yên girêdayî bi Hemasê vê dike.
Şerên di navbera girûpên Felestînê yên girêdayî rejîma Îranê ve û Îsrayîlê, civaka Îranê parve dike. Alîgirên şer yên ku dijberî girûpên girêdayî bi rejîma Îranê ne û dijberên piştevanên rejîmê û alîgirên taqimên şerajo yên çekdar, di bin siya parastina xelkê Felestînê de.

Tayê yekem ku alîgiyra şer dikin, berevajî piropagendeyên rejîmê, ne dijberê xelkê Felestînê ne û ne piştevanê Îsrayîlê, belkî civakeke azadîxwaz e ku li hember sîstema serkutkar a rejîma Îranê sekinîne û hemû çalakiyên grûpên çekdar yên Hemasê jî di çarçoveya sîstema reîma Îsalmî de mêze dike. Ev jî tê ser vê hindê ku rejîma Îslamî ya Îranê di siyasetên xwe yen hindur û derve de li gorî hêviyên civaka Îranê tevnagere û siyasetên derve yên rejîma Îranê li ser bingeha îdeolojîk a wê gefê ji ewlehiya herêmî û navneteweyî dike, siyasetên wê yen hindur ji bilî tepeserkirin û kuştinê, gefê ji ewlehlî û pêkvejiyana gelên Îranê deke. ji ber vê çendê ye jî ku sîstema tepeserkar ya rejîmê, rê nade dengê wan weke alîgirên rejîmê derkeve.
Tayê duyê yan ku em bêjin bikujên mirovhez, ev dijberên şer yên piştevanên rejîmê ne. Di çend rojên borî de û Ji bilî dem û dezgehên hikûmetî yên rejîmê, meşeke berçav ji xelkê, nemaze li Tehranê derketin ser şeqaman û bi hildana ala Felestînê, dijberiya xwe tevî Îsrayîlê îlan kirin. Serbarê vê çendê ku dezgehên ragihandinê yên rejîmê meşên han li ser navê hemî xelkê radigihînin, lê ezmûnên berê eşkere dikin ku beşdarên meşa han, ne nûnerê civaka hişiyar a Îranê ne, belkû dûkevtiyên siyaseta rejîmê ne ku li gel û azadiya gelê Felestînê weke emrazê xapandina civaka navneteweyî mifahê werdigire. Meşa han ya xêlî li serên rejîmê yê ku bi eşkere dane xuyakirin ku ne tenê baweriya wan bi azadî û jiyana azad çinîne, di heman demê de jî li dijî azadiya welatiyên Îranê sekinîne û her rojê Armîta Geravend yan Jîna Emînî'yekê di pêxema parastina sîstema rejîma Îslamî ya Îranê de dikujin. Beşeke din jî ew in yên ku di dema serhidana azadîxwaziyê" Jin, Jiyan, Azadiyê"de, li pey Ronaldo bi kîlometran direviyan. Lewma bila her kes bizane ku ev bikujên azadiyê ne û xêliya mirovheziyê rûmetê wan naveşêre.



# Şerê li navbera Hemas û Îsraîl û rola welatên wek rejîma Îranê







**N. Hûmen Simko**

Şerê li navera Hemas û Îsraîlê, niha yek ji girîngtirîn û aloztirîn pirsgirêkên devera Rojhilata navîn e û nigeriyên cîhanî li pey xwe aniye. Ew şer li devera Xezê de dest pêkiriye û bûye sedem ku welatên din seha nigeraniyeke kûr bikin û li pey destêwerdan li deverê de bin. Li wî şerî de rejîma Îranê wek piştevanê Hemasê, piştevanîkiriuna xwe ji vê girûpê daye zanîn lê înkara her cure rolek li vê êrîşê de dike.

Ew yeka li halekê de ye ku rejîma Îranê bi şandina alîkariyên malî û cebilxane bo Hemasê, hewla bihêzkirin û piştevanikirina wan dide lê li rû de tê xuya ku Hemasê biryara êrîşkirin bo ser Îsraîlê tenê bi xwe daye û rejîma Îslamiya Îranê bi awayê rasterast tevlî şer digel Îsraîlê nebûye.

Ev mijare bûye sedem ku nigeraniyên cîhanî li derheq dijwartirbûna wan dijayetiyan û şeran li deverê de zêde bibe û hejmarek zêde ji welatan li pey rêçareyan bikevin da ku wan dijayetiyan kêm bikin û rêçareyek bo cihgîrkirina aşitiyê li deverê peyda bikin.

1- Tirkiye wek welatekî Rojhilata navîn li vê deverê de xwedî bandor e û cehdê dike ku wek navbendçiyek li şerê Hemas digel Îsraîlê de rolek ektîv hebe, Tirkiyê berê jî kariye li çend alozoyên deverê de rolek girîng bilîze lê hêj nayê pêşbînîkirin ku gelo Tirkiye dê bikare wek navbendçiyek li şerê Hemas digel Îsraîlê de rol hebe an dê tevlî şer bibe.

2- heta niha şerê Hemas û Îsraîlê bi qasekî berfireh nebûye û welatên din bi rastersat beşdarî li vê şerî de nekirine ku bibe şerê cîhanî yê sêyem û egera vê yekê jî kêm e. Ew şere niha şerekî li deverê de ye û piraniya welatan hewlê didin ku bi rêya dîplomasiyê wan aloziyên bi xwîn kêm bikin û rêçareyekê bo deverê peyda bikin.

3- rejîma Îranê wek yekem welatê piştevanê terorîzmê li cîhanê, piştevaniyê li Hemasê dike, rejîma Îranê bi şandina alîkariyên malî û cebilxane bo Hemasê hewla bihêzkirin û piştevanîkirin li Hemasê dide lê heta niha ti belgeyek serast ji rola rasterast a rejîma Îranê li şerê Hemasê digel Îsraîlê de nehatiye belavkirin, lê pêka gotina berpirsên “Hemas, rejîma Îranê bi milyaradan dolar heta niha alîkarî daye Cehada Îslamî û Hizbullah a Lubnanê”, û li piraniya ragihandinên xwe yên fermî de ev yeka bi tekezî bas kirine.

Li vê derheqê de rêberê rejîma Îranê “Elî Xamineyî” berî şerê Hemasê digel Îsraîlê bi tekezî û eşkere alîkariyên hemû aliyane a rejîma Îranê bo girûp û taqimên li dijî Îsraîlê bi taybet “Hemas, Hizbullaha Lubnanê, Cehada Îslamî, Hûsiyên Yemenê, û çend taqim û milîslên din” ragihandiye û bi 10an carî jî ew yeka dubare kirine ku her hêzek digel Îsraîlê şer bike ew dê bi hemû awayekî hevkarî û piştevaniyê li wan bikin.

Li vê dawiyê de rejîma Îranê ji tirsê êrîşa Îsraîl û Amerîkayê bo ser xwe, paşekêşiyeke berçav ji piştevanêkirina rasterast bo Hemasê kiriye ku dê paşhatên dijwar ên siyasî yên giran bo rejîma Îranê hebin û renge bandora xwe li ser hêzên wiha ji dest bide.

4 – Li derheq Felestîn û Lubnanê de bo tevlîbûn bi şerê digel Îsraîlê ti pêşbêniyeke serast nayê kirin lê beşek ji girûp û taqimên milşiyayî yên li wan deveran de renge bersiva êrîşên leşkerî yên Îsraîlê bidin, herwisa renge li dijwartirbûna dijayetî û berdewamiya şerê Îsraîlê de beşek ji girûpên din ên felestînî û Lubnanî tevlî şer bibin.

5 – Civaka welatên Îslamî jî bi parêzvanî û bi pêka rewşa şer, Îsraîl renge wek bersiv bi Îsraîlê beşdarî şer bibin lê hewceyî gotinêye ku her welatekî berjewendî û siyasetên taybet bi xwe hene û renge ti welatek amade nebe bo piştevanîkirin li Hemasê welatê xwe tûşî pirsgirêkên kawilker bike û ev yeka li destê birêveberên wan welatan de ye. Herwisa renge hejmarek ji welatên civaka Îslamî bixwazin bi rêyên dîplomatik bo kêmkirina aloziyan hewlê bidin û rêçareyek bo cihgîrkirina aşitiyê peyda bike.

Li encamê de şerê Hemasê digel Îsraîl ne bi tenê dê bandoreke zêde li ser Rojhilata Navîn hebe, belku nigeraniyên cîhanî jî li pey xwe anîye û civaka cîhanê hewlê dide ku rêçareyek bo bidawîanîn bi wan aloziyên bi xwîn peyda bike lê bi sedema êrîş û kiryarên Hemasê li girtin, kuştin û îşkencedana xelkê medenî, hêcetek wiha bi destê Îsraîlê daye ku heta dawîanîn bi pirsgirêka Hemasê nasekine.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdis̆tanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (456)